

Gotara hejmarê	sernivîser.....	4
Kurd di Mu'cem Elbuldan de	Jan Dost.....	6
Kurtelêkolîneke dîrokî li ser Zarawayên „termên“	Cemal Xeznedar.....	10
Rewşa wêjeyî li başûrê Kurdistanê	Pîr Xidir Silêman.....	15
Çîrok an Çêrok	Keça Kurd.....	23
Rexne: Mem û Zîn a Ehmedê Xanî Werger: M. Emîn Bozarslan	Rexnevan: Perwîz Cîhanî.....	26
Sobarto di navbera şewatên gewde û Giyan de	Nivîs: Mesûd Hesên Werger: Mihemed Salih Mehmûd.....	43
Helbestvanê kilasîk (Wida'î) ji Rêvingiyê vegerya	Se'îd Dêreşî.....	54
Helbestvanê Elman Haynrîş Haynê	Heyderê Omer.....	72
Newroz, Dr. Golmorad Moradî	Cankurd.....	82
Kurteçîrok		108
Kula Helebê	Mehmet Aktaş.....	109
Hezkirineke Teknolojî	Helîm Yûsif.....	116
Navên nûjen	Muhemedê Zeyno.....	120
Helbest		122
Hin Sonetên William Shakespeare	W: Husein Muhammed.....	123
Dilê Min	Nilgün Demirkaya	126
Bablîsok	Selîm Biçûk	129
Dilê min	Hekîm Sefkan	134
Li nêzîkî girî	Nezîr Palo	135
Hizr û pênuşa azad	Konê Reş	137
Rojavayê Kurdistanê du belgenameyan de	T.Marînî	139
Belgename	W: T. Marînî	141
Peyva Kongirê Damezirandina	YNKRE	149
Ji bo bîranîna sînemevanê kurd Yilmaz Güney Festîvala Filimên kurdî li Berlîn		153

Gotara hejmarê

sernivîser

Ger dê hebûwa me îtîfaqek .
 Vêkra bikira me înqiyadek .
 Tekmîl dikir me dîn û dewlet .
 Tehsîl dikir me ilm û hikmet .

Belê ..Tevî ku helbestvan û ramanbîrê kurd ê mezin Ehmed ê Xanî (650–1708 z) beriya sê sed sal weha çûbû, mixabin ev gotin hê di guhên me de lûsekî bo xwe dipelîne, û li rêya ku tê re derbas hiş û dilên me bibe, digere .

Guh, di civakên lêvane de, mezintirîn rol, di tenga wergirtina çandê de dilîze, ta ku mirov dikare bibêje ew, di vê penavê de, yekemîn alav e di destên civakê de. Lê civaka me, tevî ku ta roja îro jî hê mirov dikare bibêje ew civakeke devokî ye, mixabin guhên wê xulmaş in, lewre jî gotin û bangên pêşiyên rêzdar û rûmetdar ber bi bê ve çûn, û berên xwe nedan, û nikarîbûn nihoyekî layiq û pejrاندî pêkbanîna.

Ji ber vê yekê jî banga Xanî yê nemir hîn û hîn guhên guhdar dipelîne. Gelo wê zêtîk pêrgî ewan guhan bibe ?!.. Ez bawer im erê ..

Şana vê (**erê**) ya me ewe, ku di van demên dawî de gelek bizavên nirxbiha, di hemî warên rêzanî, civakî, aborî, rewşenbîrî û wêjeyî de, diyar dibin û hêviyên xwe ber bi armancên yekgirtin û hevgirtinê ve dibin.

Ev boçûn û nêrîna me, hemî bizavên kesayetî û tekane, nirxbiha dibîne, û wek çawa tê gotin birrîn û derbaskirina bergehên dirêj bi gavekê destpê dike, weha jî bizavên kesayetî wek kevirên bingeha avahiyên tene xuyakirin, û avahî li ser wan bilind dibe, ta ku banek li ser wan tê raxistin, û wan keviran hemiyan dighîne hev û du ..

Yekîtiya nivîskaran dil heye, di vî warî de, bibe ew ban, siya xwe bide ser nivîskarên me, da pê re „**bikin înqiyad**„ û gîyanê Xanî rihet bikin, ku neviyên wî berên xwe danê rêya „**ilm û hikmet**„ ê ..

Yekîtiya nivîskaran ne berhema îroj bû , belê ev deh salên bihurîn bi vê hewildanê avisbûn, û gelek bizavên balkêş li welêt diyar bibûn, û ev hêviya ciwan di sîngên gelek kesên rûmetdar de dikelî, ta ku pirê caran dighîşte ber bûyîn û heyînê, lê di roja 24.11.2001 de, bû rastiyeke heyînî . Destên bi awakî tekane li ba dibûn, di wê rojê de pêrgî hev hatin û (**YEKÎTIYA NIVÎSKARÊN KURDISTAN –ROJAVA**) li Elmanya damezirandin, da bête teqezkirin, ku gava destek bixwaze biharê çêke, divê ew dest her û her li ba be, wê rojekê pêrgî hevalên xwe were û wê vêkra bihara erkên pîroz û nirxbiha biafirînin .

Kovara me (**PÊL**) yekemîn berhema yekîtiya nivîskaran e, ew dê, di vê qunaxê de, yeke heyamî be, car caran, di salê de, wê bikeve destan, û ta ji wê tê, wê erk

û mebestên bûyîna xwe pêkbîne , û wan biparêze . Wê sîngê xwe ji hemî celebên wêjeyî û metiryalên ramanî û rewşenbîrî re veke , nemaze ji lêkolîn û babetên rexneyî, lêgerînê û vekolînê re, ji ber ku pirtûkxaneya me di vî warî de, pir lawaz e Ji ber ku ev war bi xwe jî mifatîrîn û sûdtîrîn rêya pêşvebirin û nûjenkirina wêje, û wergirtina çandê ,û çalakkirina hişyariya civakê ye .

Lê çima ew bi vî navê (**PÊL**) hate navlêkirin?! Peyva «Pêl» di bingeha xwe ya zimanewanî de her şana tevgerê ye, dijbera rawestîna ye. Tevger jî jiyan e û rawestîna rengê ji rengê mirinê ye, gelê me jî li seranserî hebûn û dîroka xwe şerê li dij mirinê û kujtîna ajotî, û hê jî di wê rê de ye .

Dîsan peyva (Pêl) di bingeha xwe ya hunerî de wateyeke ciwanî heye , ku dikare giyanê tevgerê bi tablowên bê deng de berde, da bi temaşevanan re bikefin dan û standîna, û guftûgoyê bikin.

Pêl di bîranîna 105saliya Mîrê peyva kurdî, Mîr Celadet Bedirxan û 70saliya weşana hejmara yekem ji Kovara HAWARê bi xemil û xêzeke xwe ya taybet tê jiyanê û her weha rêya Hawarê di rastnivîsê de dişopîne, lê bi têbîniyek biçûk, ku ew jî ev e: Hawar di nav cergên xwe de, peyva (KO) bi kar tanî, lê ji ber bêhtîrîn kovar, rojname û nivîskarên gelê me (KU) bi kar tînin, em bi mefa dibînin, ku em jî weha bi vî awayî,-bi mebesta yekgirtina rastnivîsa kurdî- binivîsin.

Bi vî awayî,dîsan (Pêl)dibe şana jiyanê û tariya rawestanê diqelêşe. Êdî werin em destan bidin hev û vêk ra govenda jiyanê şên bikin ...

Kurd di Mu`cem Elbuldan de

Jan Dost

Mu`cem Elbuldan pirtûkeke, Yaqût Elhemwî sala 625 koçî nivîsîye, ew ferhengeke ji bo navên bajar û kela û derên cografî ye, ku nivîskar bi xwe ew dîtine yan navê wan di helbestên erebî û jêderên dî de dîtine û xwendine. Ev berhema cografî ya bi nîrx ku yekemîn pirtûk bû di vî warî û vê babetê de, behsa Kurdan û welatê wan jî dike. Bêguman di berhem û jêderên dîrokî û cografî û edebî û her babetî de, navê Kurdan û pesnê welatê wan derbas dibe û mirov bi xwendina wan jêderan tê digihîje ka bi çi çavî li kurdan dihate nerîn? Kurd çawa dijîn, bajarên wan kelehên wan tixûb û sînorên wan çi bûn û li ku bûn, eger em xwe ji rastîyê bi dûr nexin, em dibînin di rêya berhemên ku di serdema Islamê de hatine nivîsîn, hatîye parastin, û bi destên kesin ne Kurd, ne weke ku nîfşek ji nivîskar û rewşenbîrên Kurd dibêjin ko di dirêjahîya dîrokê de tim û tim hatîye xwestin ko navê kurdan ji holê rabe!! Berhemên kesên mîna Elteberî, Elmesûdî, Elqelqesendî, elmeqrîzî û Ibn Hewqel û xeyrî wan, çavkanîyên mêjûya kurd û Kurdistanê ne, berîya ko şerefxanê Bedlîsî weke kurdekî dest bihavêje nivîsandina pirtûkeke taybet li ser dîroka Kurdî.

Eger di hin berhemana de behsa Kurdan ne li gor dilê me hatibe kirin, nayê wê wateyê ku Kurd rast weha bûn yan jî ew nivîskarên çewtîyên dîrokî û civakî derbarî dîrok û nijadê Kurdan de nivîsîne, kesin şovenîst û nijadperest bûn, divê em bi pîvanên îro mijarên duh nenirxînin û eger em bixwazin ji toz û tirabêlka dîrokê tiştê pak û sade wergirin ji bo xwe, divê em jî tu carî bêjengeke nijadperest bi kar neynin.

Di vê gotarê de emê çend mînakên ji pirtûka me behsa wê kirîye bînin û binêrin ka çawa behsa kurdan di berhemên klasîk yê Islamî de dihate kirin!!

Dema ku Yaqût behsa bajarê Irbil(Hewlêr) dike dibêje: pîranîya xelkên wê kurdin û hemî gundên derdorê jî Kurd in, û di gel ku ew bajarekî mezin e, avahîyên wê û xanîyên wê û xoyên xelkên wê weke yê gundane. Pişt re behsa helbestvanekî dike navê wî Nûşerwanê Bexdadî ye û bi leqeba şeytanê Iraq tê naskirin, her weha helbesteke wî ya bi erebî jî tîne ku tê de dev dihavêje Hewlêr û xelkên wê û peyvî kurdî bi Zaravayê Kurmancîya jêrîn jî di helbesta xwe de bi kar tîne.(116/1)

Her weha nivîskar behsa gundekî ji gundên hewlêrê dike navê wî Bakelba ye û dibêje: ji zanayên wî gundî hevalê min Hisên kurê şerwîn ê celalî ye, celalî jî ji êlên Kurdan e.(261/1)

Li cihekî dî nivîskar qala cûreyek beranan dike ku dûvên wan gelekî dirêj û mezinin û dibêje: dûvê wan beranan mîna yê beranên Kurdî ne.(339/1)

Ji kelehên Kurdan yê ku di Mu`cem Elbuldan de behsa wan bûye, Kela Beşîr e, yek ji kelayên Kurdên Beşnewî ye, li devera Zozanan.(339/1)

Telheftûn: bajarokeke li hêla Irbil(Hewlêr) karwanên ku diçin Azerbeycanê li wir vêsa xwe dikin, ew di nava çiyana de ye û xelkên wê hemî kurd in.(455/1)

Di behsa keleha Cubeyl ya li kevîyîya derya spî ji welatê şamê dikeve , Yaqût çîrokeke balkêş tîne û dibêje ku ew berê di destê Ifrencan de bû, Selahedîne Eyyûbî ew rizgar kir û hinek ji Kurdan tê de bi cih kirin, lê piştî deh salan Kurdan keleha xwe firotin û ji wir bar kirin û tu kes nizane berê xwe dane ku!!(34/2)

Curdeqîl: Kelehek e li derdora zozanan paytexta memleketa kurdên Buxtî(Botî) ye.(46/2)

Cûzeqan: Nîfşek ji Kurdan e li derdora Helwanê bi cih dibin. (91/2)

Cûze: gundek e li çiyayên Hekarî yê Kurd .(92/2)

Di behsa bajarokekî ji yê Musilê de , em rastî siyaseteke kevnênû dibin, ew jî erebkirina navên cih û warên kurdî ye, nivîskar dibêje: Elhedîse bajarokeke li rojhilatî çemê Dicle, nêzîkî çemê Zab e, ew bajarokekî wêran û kavi bû, xelfîyê Umewî Merwan bin Muhemmed(yê ku diya wî kurd bû) ew ji nû ve ava kir, dema xwest

navekî lê bike, li navê kevin pirsî, jê re gotin Nûkird e, û gava wateya Nûkird nas kir , ferman kir ku navê bajêr bikin Elhedîse(ku wergerandina nûkird e. (162/2)

Hisnul Ekrad: (Keleha Kurdan) keleheke asê ye li rojavayî bajarê Hims e, mîrekî ji mîrekên şamê bircek li wir ava kir û hinek ji kurdan weke berayik(pêşeng) tê de bi cih kirin û meaşek ji wan û malbatên wan re girêda. Wan Kurdan ew birc xurt û asê kirin heta bû keleheke mezin û li himber ifrencan rawestîya. Pişt re kurdan keleha xwe firotin !!! û çûne welatê xwe !!(152/29)

Zozan: welatekî di navbera çiyayên Ermînya û xelat û Azerbeycan û Diyarbekir û Mûsilê de ye, xelkên wê ermenin û êlên Kurdan jî tê de hene. Ibn el esîr dibêje: Zozan herêmeke dirêj û pehn e li rojhilatê dicle, gelek kela tê de hene, hemû jî kelehên Kurdên Beşnewî û Buxtî(Botî) ne(488/2)

Penêrê Zûmanî: zûm nifşek ji kurdan e, wilayeteke wan heye.(489/2)

Sermac. Kelehek e asê ye di navbera Hemedan û Xûzistan li elcibal(Kurdistan) e. ew keleha bedir kurê hesnewêh yê kurd bû û keleha wî a herî asê bû.(42/3)

Sîser: bajarekî hevsînor e bi hemedan re. Ji ber ko ew di navbera sî girikî de ava bû ye, ev nav lê bûye. Gelek kanî ji wir diherikin loma jî navê wê sedxanî bû(xanî di kurdî de tê wateya kanîya avê jî) ew berê mêrg û çêrgeha pezên Kurdan bû (105/3)

Şîmah: keleheke nêzîkî Nehawend , hinekan ji kurdan ew li dewsa kaviên gundê Ebîeyyûb ava kirîye. (136/3)

Tewd: bajarokek e li seîdê Misir, mîr Derbasê Kurd di serdema Selahedînê Eyyûbî de ew ava kir (270/3)

Ellûs: ji kelehên Kurdên Buxtî(Botî) ye (346/3)

Ferhan: li Hemedan e, golek e ko payîzê dibe xwê û Kurd wê xwêyê dibin û li bajaran difiroşin (432/3)

Fenek(Finik): keleheke asê ye ji kelehên kurdên Beşnewî nêzîkî cizîra Ibn Umer(cizîra Botan) e. ne hakimê cizîrê û ne jî tu kesekî dî nikarin dest deynin ser. Ev bûye nêzîka sêsed salî di destê wan kurdan de ye.ew Kurd jî xwedan xîretin û kesên xwe dispêre wan diparêzin û qenciyê pê dîkin (447/3)

Qeymer: kelehek e ji kelehên Elcibal(Kurdistan). Di navbera Mûsil û Xelatê de ye, hemî şênîyên wê Kurdin, ji fermanrewayê wan re dibêjin:Ebulfewaris (109/4)

Lurr: nifşek e ji Kurdan, li çiyayên di navbera Esfehnan û Xûzistan de niştcih dibin, ji welatê wan re tê gotin: Lurristan, her weha ji wan re tê gotin Lor jî (177/4).

Lêliş(Laleş): gundek e li rojhilatê Mûsilê ye, şêx Edî bin Musafir yê şafiî û şêxê Kurdan û pêşwayê wan û kurê xwe, ji wê deverê ne!!.(184/4)

Li dawî dixwazim bibêjim ko beşekî mezin ji dîroka milletê Kurd , ji pesnê rabûn û rûnioştina Kurdan û dab û adetên wan, ji bajar û keleh û gundên wan, di jêderên islamî ên kevin de belavbûyî ye, pêwiste ko em weke lêkolînerên vê serdemê, wan qetik û perçeyên derbarî milletê Kurd de bicivînin û bikin yekparçe, da ku bingeheke dîrokî bi rêk û pêk ji dîroka kurdan re û ji kesayetîya milletê Kurd re deynin, û bi wî çavê kêr li jêderên Islamî nenihêrin. Çi ku ew jêder ayîneya hezar û dused sal ji mêjûya me re ne û em tê de hatine parastin, weke çawa em di çiyayên xwe de hatine parastin.

Jêder : pirtûka Mu`cem Elbuldan- Yaqût Elhemwî. Weşanên dar lhyaa Elturas Elerebî.

Beyrût-Libnan çapa yekem 1997. reqemên di nivîsê de çêl li rûpel û cildên pirtûkê dîkin.

Rewşa wêjeyî li başûrê kurdistanê

„Li bîranîn û bangewaz“

Pîr Xidir Silêman

Pêşgotin:

Çaxê mirov bixwazit berhemê wêjeyî yê qonaxekê li deverê hilsengînit, gereke rewşa wê qonaxê li wê deverê û derdorê wê ji layê siyasî, abûrî, civakî û rewşenbîrî şirove bike, ta ku radeyê kartêkirina wan faktorên li ser kesayetî saykolociya edîb û nivîskarên wê deverê û berhemên wan li ber çav bigirît û vekolîna wî bikefte di xaneyê karê zanistî de.

Her hosa divêt berhemê tevaya wan nivîseran bi hûrî xwendibit û li demê berhevkirina vekolîna ew berhem li ber destî bin, ta ku dîtinên xwe bi nimûneyên bijare ji wan berhemên piştewan ket, ne her ev e, belkû gereke vekoler bi xwe jî pispor û taybetmendê biwarê nixandina edebî bit..

Sebarek bi xala yekê, ha ji min were pê navêt bi dirêjî bas bikim, çunkû xwênerên hêja rewşa gelê Kurdistanê di van 150 salên borî de, dizanin.

Sebarek bi xala diwê jî, anku hebûna berhemên wêjeyî li berdest li vêderê , yê girêdaye bi rewşa siyasî a ne aram û dijwar ya devera me , dibit ya bi serê min û namxana min hatî, bi serê piraniya nivîserên me jî hatibit, di van 30 salên borî de, sê cara min namxana xwe bi pirtûkan xemilandiye û ji naçarî piştî xwe dayê, li sala 1975, 1991 û bo cara sêyemîn li sala 1996 ku ev 6 sal in qedera min keftiye xerîbiyê û destê min ji namxana min û naxaneyên xemilî yên devera rizgarkirî dûr keftiye“

Rewşa Siyasî:

Her wekî diya re, li nîva yekê ji sedeyê nozdê her sê mîrgehên kurdan (Mirgeha baban, Soran û badînan), li başûrê Kurdistanê hatin herifandin û ew dever rastewxo kefte bin deshelatdariya dewleta Osmanî de, û di wê rewşa dijwar de ma heta cenga cihanî a yekê.

Piştî wê cengê deshelatdariya hikumeta Şêx Mehmûd û serkutkirina wê bi agir û asinî ji layê hêzên dagîrker û ji encama kêşeya likandina îyaleta Mûsil li başûrî Kurdistanê –bê xwesta milletê kurd- bi dewleta nû ya Iraqê ve û berdewamiya hikumetên yek li yekên Bexdayê û piştewaniya Ingiltêra û hevkarîya dewletên dagîrkerên parçên din yên Kurdistanê ji bo vemirandina giyanê kurdîniyê û pêlêkirina mafê rewşa yê gelê me..

Lê berxwedana gelê me li wî parçeyî her ya berdewam bû, şoreşên yek li dû yeke din, Barzan û rola komela Hîwa û damezirandina K.D.P. ji bo berevaniyê ji mafê gelê kurd, şoreşa 14 Tîrmehê sala 1958ê û danpênana bi fermî bi mafê gelê kurd, ku kurd û ereb li vî welatî hevpişk in, Vegeryana nemir Mustafa Barzanî û bi gurbûna bizava rizgarîxwaza kurdî, lêvebûna Ebdilkarîm Qasim ji sozên dayin kurdan careke din dest bi şerê berxwedanê, li 11 Îlonê sala 1961ê, berhemê wê xebata çekdarî (Beyana 11 avdarê, sala 1970) û danpênana bi mafê Otonomî bo kurdan di çerçewa Iraqê de, lê pîlan û tektîkên na rewşa yên hikumeta Ba, is li Bexda ji bo serkutkirin û jêkbijkandina bizava rizgarîxwaza gelê me, despêkirina şerê berxwedanê li sala 1974-1975, pîlana şûm ya Ceza, îrê û daşikestina şoreşa kurdî, siyaseta bi erebkirin û raguhestinê, bêomîdiya gelê kurd careke din dest pêkirina şerê berxwedanê li dijî hovîti û diwariya hikumeta Beis, bi karanîna çekê kîmawî û kareseta Helebçe a reş dijî gelê me, cenga Kendavê, serhildana tevaya gelê kurdistanê li başûr, reva sipî a miliyonî û vegeryan û guherînên li astê deverê, hîlbijartina perlemanê Kurdistan, damezirandina hikumeta herêmê li parçeyê rizgarkirî, şerê navxweyî û qonaxa nû ku cihê hêviya gelê kurd û dostên wan bi giştî û xelkê deverê bi taybetî...

Dema serqelemkên van rûdanên bi rêz dikeyn, dibînin, ku dagîrkerên Kurdistanê ne bes xwestine miletê me tepeser bikin û samanê wî talan bikin, belku hewl dane nasnama me binpê bikin, welatê me kavi û wêran bikin, kaniyên avê bixetimînin, ber li ser berî nehêlin û ji ber rola giring ya rewşenbîrên kurd, her ku dagîrkeran delîve û keys dîtine, derbên here dijwar li rewşenbîriya kurdî dane.

Ji bo herifandina kesayetiya mirovê kurd, heta ji wan hatiye, astengî êxistine rêya fêrkirin û hînbûna zimanê kurdî. Lê cihê dilxweşiyê ye, ku tevaya van rûdana û li wî destûdarê dijwar yê gelê me tê de dijîya û heta qonaxa îro wêjevan û nivîser û rewşenbîrên me wek taxeke bîrtîz û hestnazik û kurdperwer tim û tim nûnerên wijdanê xwe bûyne, bi helbest û nivîsînên xwe mîna şemalka rêya xebatê ronî kirine, kurên miletî saz kirin e, danîne û şiyar kirin e.

Pîlanên dagîrkerên kurdistanê ji bo çemandin û helandina gelê Kurdistanê û samanê me yê çandî û binpêkirina nasnameya me a netewî riswa û şermezar kirîne.

Hejî gotinê ye, ku nivîser û wêjevanên me ne her qurbanî bi xweşî û lezetên jiyandane, ne her bi dev û nivîsîn di gel êş û janên miletê xwe bûyne, belku gelek caran bi destekî qelem û bi destê din çekê berxwedan û xweragiriye hilgiritine.

Mil bi mil di gel Pêşmergek qehreman qada xebata kurdîniyê şarandîne û şehîd dayîne mîna şehîdê wêjevan û dîroknas Enwer Mayî. Her di vî warî de û ji ber rolakarîgerê wan wêjevan û nivîseran, li ber sînga girtina pîlanên dagîrkeran. Rêjîma Bexdê çendeha nivîserên me bi şeweyekî dirindane şehîd kirîne, mîna şehîdan seyda Salih Yûsîfî, Şakir Fetah, Dilşad Merîwan, Abdilxaliq Marûf û li vî dîmahiyê nivîser û dîroknasê navdarê kurd Mele Cemîl Rojbeyanî.., ji bilî yên di hebs û zîندان de mayîn, cor û cefa kişandîn, yan jî koçber û derbeder bûyîn.

Vêca ez ji kîderê dest pê bikim û kî wêjevanî bînim bîra we??

Bêseranî 164?-1706, Xanî Qubadî 1700-1759, berî sêsed salan, yan jî basê gul û gulzar û dilterî û rewanbêjiya Nalî bikim, di gel Salim û Kurdî di nêva yekê ji sedeyê nozdê de:

*Dwêne êware niwêjî şewan
Beyanî da spîdey baxî şewan
Lê tirsî tel'etit roj her weku şet
Be rû zerdî helat û kewte kêwan
Meke lomeyî pêşewî dil ke em şew
Peşêwa we le ber perçem peşêwan
Şerabî le'îlî rûmanî le Nalî heram e
Beyî mizey maçêkî lêwan" NALÎ*

Yan basê derdên **Nalî** li xerîbiyê bikim û ew helbesta ji **Salimê** helbestvan re şandiye Silêmaniyê:

*"Qurbanî tozî rêtim ey badî xoş mirûr
Ey peykî şareza be hemû şarî Şarezûr"*

Basî derwêşî û xwednasî û soffizma di helbestên **Mewlewî**, **Mehwî** û **Bêxwedî** de bikim, yan nazikiya helbestên **Mewlewî**:

*"Gul çon rûy azîz we nezaket poşan
Firawan çon seyl dîdey min çoşan"*

Basî zimantîjiya helbestên **Şêx Reza Talebanî** di nêva diwê ji sedê nozdê de bikim, yan jî hawar û gaziye **Hacî qadirî Koyî** ji bo şiyarkirina gelê kurd bikim:

*"Wa rêgetan debestirê elatî caf û bilbas
Ger mirdûn ler german memnû'e biçin bi kiwêstan" H.Q.Koyî*

Dema piştî cenga cîhanê a yekê û nemana dewleta Osmanî û peydabûna dewletên netewî û bêparkirina kurdan, bi tinê guwaye kurd ne miletekî başe ne, ne xwedî, ziman, kultûrekî resenî taybet in, vêca **Goranê** helbestvan di gel **Şêx Nûrî Şêx Salih** ji bo çespondina resenîya ziman û çanda kurdî û taybetmendîya wî helbestên xwe li ser kêşeya xomalî û bi kurdiyeke petî vehûna: (**GORAN**):

„Em wîste derûn bikrayewe wek tomar
derkewta ye dinyay ciwantir le Behar
derkewtaye awat, hîwa, xewbînîn
pirşing dartir le estêreyî qubey in”

Dîsa goran dibêjît:

“Qij kalî, lêw alî, pirşingî nîga kal
ey kiçe ciwanekey serguna nextê al”

Ez basa **Fayiq Bêkesê** şoreşgêr û çavnetirs bikim, ku di rûyê siyastmedarê ingilîz de (Edmonz), yê serkêşîya siyaseta Iraqê dikir, basê helbesta navdar ya **Bêkes** bikim, ewa bi navê “**Bîst û heft sal**” bikim:

“Bîst û heft sal min rençberî tom

Be nan û aw û cil û bergî xom

Xizmetim kirdûy le Êran û rom

Ka çî hêştî dîl û rence rom”

Yan jî dema **Bêkesî** rêya xebata rasteqîne daye ber lawên miletî:

“Darî azadî eger be xwên aw nedrê qet ber nagirê

Serbexoyî bê fîdakarî ebed ser nagirê

Nêr û mê be cûte bo weten hewlê neden

Dûre derçûnî le dîlî, mel be balê nafirê”

Nemir û hêja **Hisên Husinî Mukriyanî** û **Gêw Mukriyanî** û çapxaneyî wan, şaneke berz e li eniya xebata rewşenbîriya kurd, dema rêya weşanê bo berhemên kurdî hêsan kir.

Miletê me ji derdên civakî yên wê demê dinalî, vêca **Qani, I û Tahir Beg û Ehmed Muxtar Caf**, ku ew derd destnîşan dikirîn û hêlayîn millet bawerî bi hunera xwe hebît:

“Le xew hestin ey qewmî necîbî kurd xew zerer tane

Hemû tarîxî alem şahidî fez û huner tane”(E.M.Caf)

Ji xwe nemir **Pîremêrdê** kurdperwer, zana û qelendera pêşkerê agirê Newrozê li ser girê **Mame Yare**. Kî ji me ye her sal li cejna Newrozê vê sirûda wê ne bihîzît:

“Em rojî salî tazeyî newroze hetewe

cejnêkî konî kurd e bi xoşî hatewe

çend sal gulî hîwayê me pê pest bû ta ku par

her xwênî lawekan bû gulî alî new behar”

Pîremêrdê xudanê rojnama (Jîn), ku fêrgehek bû ji bo pêgihandina rewşenbîrên kurd. Her sirûdên herdem zindî sirûda helbestvanê ciwanmerg (**Yûnis Reûf Dildar**) bixînin:

“Ey reqîb her, mawe qewmî kurdziman

Naşkêne û danerî topî zeman...)

Vêca helbestvanên mîna **Zêwer, Şêx Selam** û rewşenbîrên mîna Refîq Hilmî û mêjûnûsê navdarê kurd **M. Emîn Zekî**, yan jî **E.Sucadî, Ibrahîm Ehmed** ê xudanê govara **Gelawêj** ku dîsan fêrgehek bû, meydana bû helbestvanên me berhemên xwe lê biweşînin..

Basa helbestvanên mîna **Dilzar û Ehmed Herdî** li dawîya nîva yekê ji sedsala bîstê û li qonaxa bê hêviyê bikim:

“Be sersamî le ser lûtkey gencî westawum

şerîtî umrî rabirdûm wek xew dête ber çawum” (**Herdî**)

Heta hêre ev gotinên min bi rêz kirîn, çend guliyek bûn ji pirêza gulzar e dibistana Nalî li naverasta sedeyê nozdê û Hacî Qadirê Koyî, li dawiya sedê nozdê û hunera **Pîremêrd, Bêkes, Dildar** û tazegeriya **Goran** û **Şêx Nûrî Şêx Salih** bûn, li nîva yekê ji sedeyê bîstê li devera Silêmaniyê, Hewlêr û Germiyanê.

Li devera Badînan jî **Melayê Bateyî, Bekir Begê Erzî, Hisnî Bamernî, Hemkê Tovî, Şêx Nûreddînê Birîfkî** û **Xeyas Neqşebendî**. Li sedeyên borî û hozanên **Tahir Şoşî, Enwer Mayî, Şêx Memduhê Birîfkî, Salih Yûsifî, Ehmedê Nalbend** û **Mele Taha Mayî** û her ji salên çilan û hir ve, li sedeyê bîstê dibînin çawa derd û janên *gelê xwe û welatê xwe diêxin rû*:

*“Ez çûme Laleşînê li nav elkî û bilbêsa
Min dî li wê ciwanek wek fenerê teyîsa
Min gote wê: tu rindî, şeng û şepal û qendî
Li berka toyê bilindî wek Torê nebî Mîsa
Go: Ez şîrîn şepal im, bi qed û xet û xal im
Kurdîstana delal im keftî me destê pîsa.” (Şêx Memduh Birîfkî)*

Nemir **Salih Yûsifî** weha digot:

*“Hewar e, hewar e birayno hewar e
Kurdîstan ey welat gazî diket xebat”*

Yan jî **Mele Tahayê Mayî** di salên çilan de, di bîranîna sêdaredana şêx Seîdê Pîran û hevalên wî de dibêjit:

*„Şînî û taziya şehîda em jibîr nakeyn çû car
Dê vekey tola nehenga wextekî zêrîn bijar
Wan mexûla rav dibestî şêr û mêr ser dihinçînîn
Tuxm û nîşê wan qelandin hemî gava dipeçînîn“*

Enwer Mayî jî layenekî derdên kurdan tanî ber çavan:

*„Ji dewlet serê şêx û mela
Jîna li kurda bûye bela
Hindî te mêjû xandiye
Çakiyek ji wan dîtiye gela
Her dem berê kurd diden
Jarî û dîlî û teşqela
-kurdîno ma ne bese ev e
her dem dê li we ken kurtan û cila“*

Ehmedê Nalbend deryayek ji helbestan bû, taxekî jînê nema heke ewî çend helbest pê ne vehûna bin û li dawiya jiyana xwe ya pir keser û derdeserî, kêrek li zîkê xwe da û xwe kuşt..

Dê bêneqonaxa salên şêstan û hir ve û li gerim-germa şoreşa Îlonê û berhemên wê berxwedanê, ku beyana yazedehê avdara sala 1970 bû, qonaxeke nû, delîvek nû ji helbestvan û rewşenbîrên me re peyda bû.

Debarî rewşenbîriya kurdî, ji wana : Damezirandina Yekîtiya nivîserên Kurd, weşana govara nivîserê kurd, ku zimanê yekîtiyê bû. Damezirandina komela rewşenbîrên kurd li Bexda û weşandina govara „Rojî Kurdistan“, damezirandin korî zaniyarî kurd û weşandina govara Korî Zaniyarî Kurd. Her hosa dezgeha weşan û çanda kurdî li Bexda Ku govarên beyanî û rewşenbîrî kurd û rojnama Hawkarî diweşand.

Rojnameyên (El-Teaxî=Birayefî) û govara kadir, ku KDP diweşand, govara Karwan û çendeha govar û rojnameyên din, ku delîveyekî baş bû, nivîser û helbestvanên me berhemên xwe tê de biweşênin û bi vê yekê rewşenbîriya kurdî geş kir, peresend û xemilî. Ew jî hebû li despêka salên heftiyan de, komek ji helbestvan û wêjevanên nûxwaz bangewa (Riwange) derxistin, ku hejandinek bû li meydana rewşenbîriya kurdî, ji pêşengên Riwange: Şêrgo Bêkes, Letîf Helmet, Refîq Sabir, Enwer Şakîlî û çîroknivîs Hisên Arif û çendên din.

Bi dehan helbestvan û edîbên mîna Enwer Qadir Caf, Ebdulla Peşew, Şêrgo Bêkes, Kerîm Şareza, Hesîb Qeredaxî, M.Emîn Penciwînî, Dilşad Merîwanî, Letîf Helmet û Mehmûd Zamdâr û çîroknivîsên mîna, Mihemed.M.Mem, Hisên Arif, Ebdila Serac, Selam Menmî, Mihemed Mukrî, Ebdula Agirîn, Reûf Bêgerd, Mistefa Salih Kerîm û hin din, derketin, ji bilî zana û pisporên xudan bawernameyên akadîmî ên bilind û taybetmend bi edeb û wêjeya kurdî mîna Dr.Marûf Xeznedar, Dr.Ihsan Fûad, Dr.Izzedîn Mustefa Resûl, Dr. Kawus Qeftan, Dr.Nesrîn Fexrî, Dr.Şukriya Resûl, Dr.Kurdistan Mukriyanî, Pakîza R. Hilmî, Dr.Ebdilrehman Marûf, Dr.Kemal Fûad, Dr.Werya Omer..

Sererayî rewşenbîrên taybetmend li biwara rojnamegeriya kurdî mîna Mihemed Mele Kerîm, Cemal Xeznedar, Mistefa Nerîman û Seîd Nakam û htd.

Her li vê Qonaxê li devera badînan jî rehetî Sadiq Behadîne Amêdî, ji bilî xizmeta wî li hemû warên rewşenbîrî û bi taybetî edeb û zimanê kurdî, her hosa Emîne Osman, Elî Neqşebendî, Dr. Mesûd Kitanî, Mele Xelîl, Hafiz Qazî û Serbest Bamernî. Em dibînin, ku stêrên geş hatine meydana vehûnandina hozana kurdî. **Dr.Bedirxan Sindî** kite-kite helbestên pir hêja ku yekser bûyîne stiran li ser zimanê piraniya xelkê deverê mîna „Bûka Kurda:

„Ey Felek bo te dinalim çima nêrgiz çilmisîn
Ew çima bextê me hoye her bê dost û bê kes in

.....
Ev ro kanê li min wê rojê Kaniya warî bizêt
Jê vexoyn desta bihilînin jê vexoyn çend me bivêt”

Sebrî Botanî bi Şîn û Şadî û Dilistana xwe ve, Ebdilrehman Mizûrî bi (Evîna çirayên Kevin û li Xelkê tehlê, li min şirînê), Xelîl Dihokî bi (Te çî got û min neanî), Feysel Mistefa, Rekêş Amêdî, Vehêl Amêdî, Têlî Emîn, Mihsin Qoçan, Edîb Çêlkî, Sebriya Hekarî, Hîvî Berwarî, Kerîm Findî, Mû,eyed Teyîb, Selman Kovlî, Segvan Ebdilhekîm, Kerîm Biyanî, Necîb Balayî, Biyar Bavî, Şewket Sindî, Dr. Arif Hîto, Diyar Doskî, Faris Ebdila Hemo, Fehmî Balayî, Serfiraz Neqşebendî..Di ware çîrokê de: Enwer Mihemed Tahir, Hesên Silêvanî, M.Selîm Siwarî, Celal Mistefa, Ibrahîm Selman û M.Se,îd Jorî. Di ware vekolînê de, Reşîd Findî, Ebdilrehman Mizûrî, Dr.Fazil Omer û Se,îd Dêrişî û li xema Folklorê Kurdî, Hacî Ce,ifer, Ehmed ebdila Zero, Mistefa Bamernî û çendên din..

Rewşa yekîtiya Nivîserên kurd:

Li sala 1970ê Yekîtiya Nivîserên Kurd hate damezirandin û govara Nûserî Kurd, ku zimanhalê malbenda giştî ya yekîtiyê bû, li Bexdê dihate weşandin, her hosa liqên yekîtiyê li Silêmaniyê, Hewlêrê, Kerkûk û Dihokê jî hatin damezirandin û çend liqan ji wan govarên xwe hebûn. Lê piştî daşikestina şoreşa Eylonê û ji ber rola karîgerê nivîserên me di nav civaka kurdî de, çend hat rêjîma Bexdê pitir astengî di rêya karê wan ê rewşenbîrî kir, ew bû yekîtiya nivîseran hate qedexekirin û paşê kirine tayek di nav yekîtiya nivîserên Iraqê de.

Hêjaye bêjim: Rêjîma Bexdê çend hewl da wijdanê nivîserên me bikirit û qelema wan erzan biket, lê bi hemû hewldanên xwe ve, çî bi tirsandin, gef lê kirin yan jî bi pere û pûleyan, rêjîmê nikarî hijmareke li ser tiliyên destan bi kêşet aliyê xwe ve, ew jî ez dikarim bêjim hinde lawaz û bê behre bûn, ku ne dikeftine xaneyê wêjevan û behremendan de.

Lê pa çend derd û astengiyên dikeftin rêya nivîserên me de, yek ji wa derdan sensorkirina pênûsê, ya din: di bare aboriyê de, nivîserên me tê de dijyan, ku ne dişyan bi asanî behre û berhemên xwe di nav qewara pirtûkan de çap bikin.

Lê tifaq û tebaya nivîserên me, pêwendî û têkiliyên wan, bizav û çalakiyên wan, ji bo bestina kor û semînaran yê berdewam bûn û gelek caran, di ser xwe re diborîn ji bo pêşkêşkirina wan kor û semînaran, yan jî xwendina parçe helbestan.

www.arsivakurdi.org

Kula Helebê**Mehmet Aktas**

Bi rojan bû, ez li wî bajarê sar, li pey rêça evîna xwe keti bûm.

Telefon, e-mail, sms... Min hemû metodên ragihandinê yên li ber destên xwe ceribandî bûn.. Lê ti deng jê derneketi bû.

Ez çend caran di nava heman kolananê de çûm û hatim, çend caran li heman qehwexane û Restaurantan geriyam, nizamim.

Ew tune bû.

Ez li kê derê rûniştim, min li kê derê bêhnek da, ez rastî şopa rojên bihurî hatim. Bîranînan ajotin ser min. Ew qul û quncikên bajêr yên ji çavan dûr, ew mekanên dîrokî, me bi hev re keşif kiribûn. Ez tu caran tenê nehati bûm wan deran. Ew cîhên ko bû bûn şahidê evîna me, ew garsonên ku ji me re xizmet kiri bûn, niha ji hin eşqperestên din re mêhvandarî dikirin.

Li ser maseyan bi tena serê xwe, bi saetan bendewar mam. Garsonên ku min ew tenê bi riya çavan nasdikirin, xwestekên min ji rojên berê lez û beztir dianîn cih. Min fehm dikir ku ew gunehê xwe bi min tînin. Helbet vê yekê jî êşa dilê min zêdetir dikir. Xwarin û vexwarinên dihatin ber min, carnar bê ku dest lêkeve, şûn ve vedigeriyan.. Carnar ji min hemu tiştên li ber xwe, bê hemd dadinuqutandin. wek hemû hestên min yên tîbûn û birçîbûnê de jî tevliheviyek çêbibû.

Dîtina cardin ruyê wê ji min re bibû armanca herî mezin ya jiyane. Ji bilî suretê wê, hemû hestên din yên jiyane di min de pûç bû bûn. Her tişt bû bû ew. Pêşeroj û paşeroja min bi suretê wê ve hatibû girêdan.. Min hew dizanibû, eger ko cardin li min vegere, wê nifteya jiyane ya ku min wenda kiri bû, disa bike destê min. Li sinorê mirin û jiyane, ewê li ber min rêyekê nuh vebike..

Ez keti bûm bîreke kûr, min hêvî dikir ku ew bêbext bibe Zîna Memê û were guliyên xwe dirêjî min bike û min cardin ji tunebûnê kaî nava jiyane bike...

Naxêr..Nehat. Ew tunebû. Ew çû bû.. bê xatir û bê gotin...

Ew çewa ji nişkava keti bû nav jiyana min, wusa jî derketi bû, çû bû...

Wê dest pê kiri bû, disa wê xilas kiri bû .. Derhênera evîna me ji destpêkê ve ew bû. Lê ez ?

Dema ew hebû, dema wê talîmata hezkirinê dida min, haya min ji dinyayê tinebû. Min ji dil û can jê re koledarî qebûl kiribu. Di dawiyê de jî ez bi dilekî rût û tazî, li meydana evîne, bi tena serê xwe ma bûm.

Dawiya havîne, destpêka payîzê carnar diricifim, carnar jî agirekî bêhevsar dikete bedena min û diherikî.

Ew çû bû, lê qebûlkirina rastiya bi jan, ji min re pir giran dihat.

agahdariya ku wê li pey xwe hiştibû. Çend caran, min li ser hev dixwend nayê bîra min. Her carê min hêvî dikir ko ez di nav wan herdu hevokan de rastî şopa bersivekê bêm. Lê destnivîsa wê pir kin û ziwa bû:

„Dawiya çîroka me hat. Edî emê nikari bin bibin yek. Niha di jiyana min de kesekî din heye! Tu jî tenê nemîne! „

Binêre li keçika zemanê. Oy Xwedêyo! em ketine çî zemanekî bêhîs û keftar ? Xwedê zane ev jî awayekî xatir xwesitinê ye. Post-modern e...

„Tu jî tenê ne mine!“ Spas. Zor spas. Çi pêşniyazeke pîroz û dilsoz !

Di serê min de, hezar pirsên bêbersiv, hezar ihtîmalên ne zelal çêbibûn..

. Gelo çima ji nişkava çû ? Çima veqetandineke bê şirove ?

Gelo ew ne dilketiya min, tenê dereweke mezin bû ketibû jiyana min? Min çi xeletî kiribû? Dibe ku ez ne mirovê heskirinê bim?

Her pirseke nû bi xwe re yeka din dianî.

Her pirsek dibû wek peykerekî, dihat û li ber min disekinî.

Eger ku wê berê çûyîna xwe bi min re xeber bida, ji min xatir bixwesta, dibe ko her tişt, ji min re ewqas giran nehata. Niha li meydanê biryareke yekalî, êşeke ne parvekirî hebû.

Ger dîwarek hebûya min piştî xwe bidayê, yan dostek hebûya ez bi hemû hêza xwe ve hembêz bikirama, dibe ko ew jana dilê min, zûtir bigîhîşte dermanê xwe.

Dibe ku ew agirê bêhevsar ji bedena min hêsantir biherikiya der..

Lê min baş zanibû ku, êşa evîneke qedexekirî nedihat parvekirin.

Mirov ancax dikaribû giriyê xwe li ber baranê bikira.

Hêsrên evînen qedexekiri p"ewist bû bi dizî ji çavan biherikiya.

Di wan rojan de, nav kolanên sar de, tu kesî qêrîna min nedibihîst. Carnan ez difikirim min ji xwe re digot ; „ Gelo xwedê çima cowên xwe ji vê tofana dil re digre. Ji bo ci qet rehma xwe nîşan nade.“

Bersiva pîrsa xwe dîsa min bi xwe dida.

Ma dema Gakoviyan Siyamend ji Xecê qetandin, ma dema Bekoyê Ewan ket navbera Mem û Zînê, xwedê ev yek nedît ? Niha bo çi ez li benda rehma wî me? Ma evîna min ji ya wan kûrtir bû ?

Qelebalixa bê xem, ya ez di nav de, mirovên kêfxweş û rûken yên li kafeterya û meyxaneyên bajêr de, haya wan li êşa min tunebû. Rojane bû tu kesî rûyê xwe venegerandibû rûyê min.

Qey wan henekên xwe bi êşa min dikirin. Qey wan li hemberî şîna min, dîlana xwe digirtin. Wê yekê jî helbet, birîna min tenê kûrtir dikir. Min di wan rojan de tenê mirovên xemdar û dilşikestî nêzî xwe didîtin.

Qey ez bû bûm, dijminê eşqperst û evîndaran..

Ez di nava miriyan de zindiyek, an di nav zindiyan de miriyek bûm?

Bi rasti jî min bersiva vê pîrsê nizanibû.

Li pey siya rojên berê, li hêviya cardin dîtina rûyê wê, roj zû dibuhurîn. Êvar zu bi ser min de dihatin.

Êvar!!?

Bi wendabûna rojê re êdî min hew dikaribû, bêkesiya xwe, rûtiya xwe veşêrim. Bi tariyê re, birîna min dixuriya.

Lazim bû dem bihata kuştin, şev zû bibuhuriya.. Di wan rojan de, carnan ez dibûm mêhvanê sifreya bawermendan, bi wan re tevî şoreşa gelê xwe ê bê xwedî û bê welat dibûm.

Nedibû...

Radibûm diçûm ser maseya nihilistan, bi wan re derdiketim rêwîtiya eraqê.

Dîsa nedibû...

Lewra li ser ti maseyê dermanê birîna dilan nedihat belavkirin.

Di rêwîtiyên alkolê de, sûretê wê dîsa tim bi min re bû. Wê yekê ez bê deng û sewt dihiştim. Kaseyên eraqê ez ji dema ku tê de dijiyam dûr dixistim, dibirim rojên berê...

Bi xeyalên wê re, ez tim di nav şerekî hebûn û tûnebûnê de bûm. Her carê, bêçare, bêhemd, di derengiya şevê de, min cardin berê xwe dida hêlîna evîna xwe ya wendakirî.

Le xew?

Na ..Na.. xew ji min pir dûr bû..

Di wan şevên xedar de, hestên min ên bêwelatiyê kûrtir dibûn. Baş tê bîra min; di dawiya şeveke dirêj de, min jê re goti bû; ``êdî tu yî welatê min !“

Bersiv bû bû ramûsaneke qaçax. Niha ez dîsa xwedî dilekî penaber bûm.

Bi saetan ez dibûm peyayê êşê, min di tariyê de çavên xwe digirtin.
Min xwe dispart bîranînên rojên xweş. Dema bihurî cardin dibû şermiya şevên min...

Waye seatên hevduheskirinê yên herî weş (hov) dest pê dikin..

Yên bê xwedê û bê qaîde. Di destpêkê de , | awa ku zarokek sêwî ya hewcedarê heskirinê xwe bispêre hembêza bavê xwe, ew jî wusa, di hembêza min de bi cîh dibû.

Demeke wusa bêdeng û bêhereket dima. Pişt re lêvên xwe yên nazik hêdî hêdî li ser bedena min digerandin. Zimanê wê yê weke marê reş, di noqteya herî hesas ya bedena min de, derdiket derve. Pişt re jî lêvên xwe dikirin lêvên min yên zuha û dimijî. Hemû quncikên bedena min heya mûyê canê min jî, hişyar dibûn..Min digot qey ez di agirê nav me de peyda bûyî de dihelim.

Ew Zaroka di hembêza min de, di nav balîf û orxanan de hêdî hêdî mezin dibû. Dibû jinek..... Jinek wek doxînsistêke perwerdekirî.

Ez di nav daristaneke destlêneketî de ketibûn ser rêyeke bê dawî.

Edî hevsarê min di destê wê de bû. Ez bi bedena xwe, bi hemû hest û peyvên xwe ve bû bûm mehkûmê wê. Ew geh li ser, geh li bin, bi kêfa dilê xwe ez diajotim nav dinyaya zewqê . Di wan deqîqeyan de çawa ko derwêşek di zikir û cesmê de xwe ji bîr dîke, destê min jî wusa, ji erd û esman diqetiyên. Dem , dinya, mirin û jiyân, şev û roj di cihê xwe de disekinîn.

Her car wê yekê çiqas dom dikir min nizanibû.

Pişt re , Ew diricifî. Ez di diricifîm.

Zeman dibû aveke nezevtkirî û di qamîşê min de wek tîrejekê derdiket der..

Em bi hev re bê nefes diman, me bi hev re dikir qêrîn.

Careke din , em bi hev re ji hemû sînoren qedexekirî derbas dibûn.. Em dibûn yek.

Jina bêhevsar siwara min, pişt re li ser meytê min wek zarokek bê parastin û sermakirî dima. Ez di nav bêhneke pîroz de, bi tēmên nuh yên li ser zimanê xwe, yên min di newala wê de nuh keşifkiribû, ji xwe derbas dibûm.

Wan bîranînên hovane yên ku êdî ti car nedihatîn dubarekirin , piştî demekê hew alîkarî min kirin. Balîf û orxan piştî demekê ji bo min bûn êşxane..

Heya destê sibê ez di navbera hişyarbûn û xewê de, di navbera xeyal û rastiyan de diçûm û dihatim. Carnan min hew dizanibû, eger ko ez bikevim xeweke giran, êdî dîtina wê bibe xewnek. Dema berbi nîvrojê min çavên xwe vedikirin, min bi lez û bez xwe diavêt derve, qey hunê bibêjin , hemû qehwexane û meydana bajêr li benda min mane. Lazim bû ez dereng nemama. Lê belê di wan rojan de ez çiqas nêzî qelebalixa derve dibûm, ewqas jî jê dûr diketim.

Bi wî awayî çend roj û şevên min bihurîn? Xwedê zane!

Li wî bajarê biyanî wextê min wek dizekî şevan, weke kûçikekî li kolanan derbas dibû. Di dawiyê de , ez bê taqet û bê hêvî mam.

Ew bajar êdî ne yên min bû. Di hundirê min de li hemberî wî bajarî dijminahiyek pêl da bû.

Rast bû wî bajarî ji evîna me re mêhvandarî kiri bû, di dawiyê de ji xiyaneta li hemberî min re jî singa xwe vekiri bû.

Ew bajar bi wê xweşik bû.

Dem ew hebû , dem ew bi min re bû, mirovên wî bajarî li ber çavên min rûken, dilgerm, mirovên wek mirovan dihatin xuyakirin. Dem ew ez ji wî bajarî dûr diketim, mîna ku herim xerîbiyê, min bêriya hemû rûniştvanên ne nas yên bajêr dikir. Ez û ew bajar, bi têlên ji pola bi hev ve hatibûn girêdan.

Lê niha ?

Niha ew têl qetiya bûn.

Ew bi tenê ne çû bû, bi xwe re hemû mirovên baş, hemû derên bajêr ên xweşik jî bi xwe re biri bûn.. Bajarê wek qîzikek çardesalî niha ber çavên min buye wek pîreke keftar a heftêsalî.

Edî ew bajar ji bo min weke meydana şerekî wundakirî, goristaneke zindî bû. Mirovên li kolanên dimeşyan wek ordiya Iskenderê Mezin di ser singa min re derbas dibûn. Qey hemuyan gotina xwe kiribûn yek û bi hev re biryara xeniqandina evîna min da bûn.

Kula Helebê tenê neketibû dilê min, tenê hundirê min pûçnekiribû. Mîna ku bi min re temamiya xweşikiya wî bajarî jî di cih de kuştibe. Ew Bajar êdî bû bajarê mirinê...

Du rê derketî bûn, pêşiya min. Yan ezê zûtir ji wî bajarî bêyom biqetiyama, yan jî minê di nav zindiyan de wek miriyekî jiyana xwe berdewam bikira.

Ez Reviyam. Wastyayî... Wek şervanekî zemanê berê, li welatekî biyanî şerekî wenda bike û bikeve rêyeke nediyar, min jî wusa berê xwe dabû xerîbistaneke nuh... Sê sal û sê rojan ez venegeriyam wî bajarî. Edî min ne ew pirskir ne jî ketim pey rojên berê. Rojekê dîsa rêya min li kolanên wî bajarî ketibû. Min biryar da ku ez çend saetan li dosta - Ew bajar tim di bala min de nêr bû -xwe ya kevnare derbas bikim. Xweziya min ew yeka nekira. Ez li mekanekî berê yê nas rûniştim, min li derdora xwe temaşe kir û rojên buhurî bibîr anîn. .

Way li mino!

Waye ew jî çend mase ji min dûr rûniştiye. Qey wek me soza xwe kiribe yek, ew ji beriya min hatiye li vir û niha li benda min sekiniye.

Ez dîtîm, bê xeberdan ji cihê xwe rabû hat li hemberî min sekinî. Ez berê gelek caran li ser rewşeke wiha fikirîbûm, min ji xwe re digot „eger ko ew rojekê ji nişkave derkeve hemberî min, xwedê zane ezê serobinî bibim. Ezê hemû peyvên ferhenga zikmakî û yên biyanî di cih de ji bîr bikim. Ezê di cih de bifetisim. Ezê lal bibim“ Lê wisa nebû.!

Weke du nasên ji hev dûr, me halê hev pirsî. Pişt re me bi hev re fîncanek qahwe vexwar. Li ser rojên berê, gotinek ji devê me derneket. Tenê carekê min bala xwe berda kûrahiya çavên wê. Xwedê zane, ger rojên berê bûya, wê awirên çavên wê di

cî de hemû hestên min yên heskirinê rakirine ser piyan. Niha ew şewqa berê di çavên wê de tine bû, yan jî min nedît.

Ez beriya wê rabûm ser piyan û min xatir jê xwest. Wê li çavên min nêrî, xwest tiştêkî bibêje. Lê negot, min jî pirs nekir...

Me herduyan jî zanibû ko êdî tu peyv nikare pêşeroj û paşeroja me biguherîne...

Jêrenot:

Li gorî hin sîroveyan dîrokî, Kula Helebê cara dawî, di sala 1915 de di dema Qetiliyên Osmaniyan yên li hemberî Ermenî û Kurdan rûyê xwe nîşan daye. Dibêjin; Kula Helebê bikeve kîjan malê û kîjan dilî, ew der di cî de pûç dibe. Hemû zindî di cih de dibin mirî.

Ji bo vê yekê dengbêjên Kurdan jî weke nifir ji evîndarên xwe yên bê bext re gotine: „Kula Helebê bikeve mala bavê te salê carek!

Navên nûjen

Muhamedê Zeyno

Di van çend salên dawî de, wek hun jî dizanin bi hezaran malbatên Kurdan, tev zarok, kal, pîr, keç û xortan dev ji welat, ji mal û hebûna xwe berdan, berê xwe dan nediyariyê, paşeroja veşartî, koçî Europa bi nav û deng bûn, cihê pêkanîna xewnên rengîn.

Nivîskar, helbestvan û wênevanan gotin emê herin li Europa berhemên xwe bi din ber çapê û bi wan navdar bibin. Kal û pîran gotin emê herin çend salên mayî ji temenê xwe di kêf û xweşiyê de biqedînin. Ciwanan gotin emê herin xewnên xwe bi cih bînin. Malbatan gotin emê herin zarokan bi şeweyekî europî çêkin.

Siyastmedar û ramiyarîvanan jî gotin emê herin pirsra gelê Kurd li bajarên Europa, li ser kenarên kolanan bi europîyan bidin naskirin ta ko ew jî herin di perlemen û dezgehên xwe de li ser belengaziya gelê Kurd panêl û semînanan dirist bikin.

Karbidestên hikumetên van welatan mirovên bi hiş û aqil in, xwedî dîrokek dûr û dirêj in, wan jî kurd pêşwazî kirin bi şeweyekî ku ne di bîr û bala tu kesî Kurd de bû, yek ser gelê Kurd li kampan belav kirin, malbat ji hev şelan din, ji hev bi dûr xistin.

Her di çi demê de mirov ji cih û warê xwe bi dûr dikeve û hêviya veşerê roj bi roj kêmtir di be, ev bi xwe tiragêdiyeke bi serê mirovan de tê. Bi ya min be sedema vê tiragêdiya gelê Kurd hunermend **Şivan Perwer e**, wî di stranek xwe de goti bû:

Xortê Kurdan li Ewropa doza me pêş ve dibin.

Va şiyar e miletê Kurd keç û xort û mêr û jin.

Em jî li welêt fikirîn, gelo wê ne baştir bibe heger em bi hezaran herin Ewropa ji bo ku ev doza me lez û hêztir bi rê keve.

Em veşerî ser jiyana ko îro em tê de dijîn, her yek ji we jî ji min baştir dizane çi rewş e, lê dîsa jî em werin ser xewnan, xewnên rengîn.

Nivîskar û helbestvanan berhemên xwe dan ber çapê, pirtûk, rojname û kovar derketin, lê ka wê çawa belav bikin û kî yê wan berhemên giran biha bixwîne.

Kal û pîr di van kampên ko mirov nikane bide ber darê rexne, rojên xwe bi dijwarî derbas dikin, bi hesret in ku herin li nav kesên xwe bimirin û di mezelên bav û kalan de bêtin veşartin.

Xort û ciwanan jî ne ma dizanin bi çi rengî bibin xwedî nasnameyeke ewropî û xwe bi erzanî berdan nav lingên pîrekan, yên ku bi temenê xaltîk û metên wan ciwanan tîn xuya kirin.

Siyasetmedar û ramiyarîvanan gotin ; dêmek em bûn europî, partî û dezgehên xwe dan ber loman û yek ser ew perçe kirin, lê belê ji salê carekê ji me re di (21) Adarê de dawetekê dirist dikin.

Tenê malbat cihê pesin û serbilindiyê ne, karê xwe bi rêk û pêk dikin, zarok çêkirin, xwedê bi parêze, bi sedan, lê em bi malbatan re ketin sergêjiyek din, ew jî pirsgerêka navên zarokan e, îro roj em dibihîzin mindalên Kurd bi navê“ Sven, Stefan, Alexander, Tania, Katya Martin.... „ hene.

Dostekî min navekî ne di bîr û bala kesan de bû li lawê xwe kiriye, ew jî „ Arnold“e. Min carekê ji wî pirsî:

- Ev nav te li ser navê apê xwe an jî xalê xwe daye lawê xwe?

- Ji roja min tu nas kirî, min zanîbû ko tu mirovekî paşverû yî , wî got min, ev navê mirovekî pir mezin û navdar e, navê dewlemendekî Amrîkî ye, wî di dema xwe de

alîkariyek bê sînor dida V. Î. Lenin, ta ku şoreşa Oktoberê li welatê Russiya bi serkeve.

We bala xwe dayê ku çî hevgerêdanek ecêb e, Birciwaziyê Amrîkî, Kommunist V.Î. Lenin û Kurdekî ji gundekî ku xweda bi xwe ji bîrkiriyê.

Li ser kar min got nasekî xwe yê elman:

- Tu bahwer dikî ku rojek bê û navên zarokên we bibin Husên, Hesên, Şukrî, Ebdulrehman....?

Nasê min yê elman devê xwe bi gazekê vekir û kenîya, dengê kenê wî çû gihîşte guhê şêfê me yê qelew, ew pêrgî me bû û pirsîya sedema kenê me çî ye , helbet me ji wî re got.

Şêfê ûr mezin tiliya xwe ya şehdê ber min kir û bi hêrs got:

- Bila hûn baş zanibin, ta ku porê serê me zer e û çavên me jî şîn in, navên mîna Hiso, Heso, Riho, Bero.... wê di nav me de nebin, de zû dev ji van tiştên vala berdin û her kes herin ser karê xwe.

Hannover 25. 04. 2001

Bi kurt û kurmancî
Hizr û pêûsa azad

Konê Reş

Ji mêj ve ta roja îro, dîtîna û çiloyîna “Hizra azad an pêûsa azad” di danûstandinê de hêj zelal ne bûye...

Di bawerîya min de, ta ku nûbûn di jiyane de hebe, ta ko mirovanti berdewam be, wê hizr û pêûsa azad di gengeşê û danûsatandinê de li ber xwe bidin.. Wek ku diyar e, hizra azad an pêûsa azad ew e, ko mirov di ramanên xwe de rastgo û duristûbêr be û ta ku mirov di ramanên xwe de weha be gerek tu qeyd û bend li dor nebin. Bi azadî karibe ji xwe re jiyaneke taybet helbijêre, bêyî ko hizr û ramanên xwe bi kotekî li ser bêne meşandin...

Heger neferek ji civatê di hizra xwe de azad be, û civata li dor ne li gor wê azadiyê be, li ber hizr û ramanên wî nekeve, ango di hizr û ramanên wî de ne gihêje, hingê hizr û ramanên wî neferê azad dibin barekî giran li ser milê wî neferê xwedî hizir û civata wî bi hev re. Hingê pêdiviyê ko desthilatek hebe ta ko wê civatê li hev ragire.. Desthilatek bi yasa be, ko rêveberîya civatê bike û yasayên xwe li ser tev neferên civatê bimeşîne, da ko cemawer di çarçoveke yasayî de bi xêr û xweşî biparêze..

Heger em bîn ser “pêûsên azad”, qunaxa giring ji hizra azad, ez ne bawerim ko pêûsek azad heye û ew pêûs ne di bin siya sansorê an terorê de ye, nexasim di welatên cîhana sisyan de. Di van welatan de sansor rola xwe dilîze, ji ber alozî û gengeşeyên azadî û demokratîyê û sansora ko heye polîtîkî ye bêtir ji civakî, ji ber ko desthilatên welatên cîhana sisyan ji nivîskaran bi tirs in, her dem û gav sawa nivîskaran di dilê wan de ye. Vêca sansora rêjîmên wan welatan rola xwe dilîze û şert û mercên xwe ferz dike..û weha nivîskar bêçar e di bin siya terorê de dijîn, û ji bêçarebûn sansoreke kesayetî (zatî) li ser xwe û berhemên xwe datînin, da ko berhemên xwe ji sansorê biparêzin û derbas kin..!

Di bawerîya min de, ev sansora zatî ko nivîskar li ser ramanên xwe datîne, ji sansorê dewletê xerabtir e.. Ji ber ku, heger sansora dewletê perçeyek ji nivîsandina nivîskarekî ku azad be, di nivîsandina xwe de, xetsor bike, nivîskar bi sansora xwe a kesayetî (zatî) nivîsandina xwe tevî xetsor dike..

Nivîskarê azad, ew nivîskarê ku di hizr û ramanên xwe de zelal be, di nivîsandinên xwe de rastgo û mêr be, li navdariya, li ser pişta çend qedexeyên civakî negere..wek: êrîşkirina li ser olê û hetîketiya bedena jinê..

Hizra azad, pêûsa azad, di zelalkirin û eşkerekirina şaş û xerabiyên civatê de ye. Ew şaşî û xerabiyên ku civat ji ber bendora wan paşketî maye..

Heger nivîskar mêr be, wê di nivîsandinên xwe de şerê wan şaşî û xerabiyên civatê bike, bê ku sansorê li ser xwe û berhemên xwe deyne. Gereke wan şaşiyên ji cemawer re raxîne ber çavan, da ku cemawer di ser wan şaşiyên biqevêze, li pişt xwe bihêle û hin bi hin ber bi xêr, xweşî û avakirinê de here..

